Ezimk

BABE DEWRÊŞ

Ez di kolaneka bajêr de dimeşiyam. Di nav taxeka hejarnişîn, dema ku min dît xurtekê pirçdirêj kulavekê spî û gulovandka sere wî tejî kirîbû. Defek li destan de bû û qêrgirîbû "Zenbîlfiroşî" li defê têxist. Dengê wî pir xweşik bû, awaza wî dilnişîn bû, ew kolan tejî kirîbû ji mirovan û dengê wî li gel lêdana defê tejî kolanê bibûn. Xelkê li dewrûber jî pere didanê. Dema ku min ev dîmene dîtî, êkser jiyana gundan li bîra min hat. Dema ku li rojên remezanê derwêş li gundan digeriyan û li defê dixistin, xelkê gundan jî mêr, jin, pîr û zarok li ser sibandan bûne gelwaz û guhdariya dengên wî dikirin. Lê awazên wî behra pitir yên ayînî bûn û awaza ji hemû yan zîqtir "ya Eyûp Pêximber" bû. Xelkê jî, ji her layekê qut û dan û dikak didanê. Ji ber hindê eva nûhoke min dîtî dibe her dirêje pêdana wê rêbazê be, ku ew jî rêbaza xwestinê be, lê ne bi rengekê êkser, tinê tiştê li vê rêbazê hatiye guhorîn, li şûna qut û dexil û danî, niho bû ye pare.

Salih Xazî

Pirsyara li vir eve ye:

Gelo, heya kengê, ev cûnên xwestinê (gedayî) di nava miletê me de bimîne û berdewam bike?!